Bername û Pêrewa Navxwe ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê

pejirandiya kongireya heştem,

“Kongireya 70 salî ya Yekîtiya Ciwanan”.

Destpêk:

Di demekê de ku pêvajoya vegeşîna civakê, di pêxema bexteweriya civakê û bidestvehatina xewnên mirovan, û azadiyên wan, pêngavan davêje, û biyavê yasayî bi xwe ve digre, pergala birêvebiriya civakê ji bo berhevkirina pêdiviyên civakî, hewcehî bi xelkîbûna hêz û şiyanan heye. Welatê me hêla bi sedema zalbûna sîstemeke dîktatorî, di nav kirîza kûr ya aborî û siyasî û civakî de ye.

Bi dirêjahiya dîroka hevçerx di Îranê de, armanca deshilatdaran çewsandina gelên wî welatî û zewtkirina maf û azadiyên mirovan, û bêçarehêlana tex û qatên pêşkevtî ên civakê bûye. Lewra hemû pêkhateyên civakî ên welatê me, di xebata di pêxema gihîştina bi siberojeke rohn, û vekirina rewşa siyasî ji bo bingehdanîna civakeke bextewer û pêşkevtî, hevbeş û erkdar in. Cihgirbûna demokrasiyê û bilindbûna buhayên mirovî, wekî mafên mirovan, dadperweriya civakî, wekheviya hevwelatiyan, û desteberkirina azadiyên takekesî, di hemû biyavên jiyana civakî de, xeynî sedem û çawaniya deshilata siyasî, hewcehiya wê bi kar û çalakiya rêkxiraw û sendîka û NGO'yan heye, ku di çarçoveya civaka medenî de tê pênasekirin.

Dema ku bas ji rewş û biyavên civakî yên cihgirbûna demokrasiyê, û civaka medenî tê kirin, hebûna çalakane ya rêkxirawan di civakê de, mercê sereke yê cihgirbûn û berdewamiya sîstemên demokratîk e. Civaka medenî bi wateya koma wan nawend û civat û rêkxistinên civakî ye ku bi dewlet yan deshilata siyasî ve nehatine girêdan, û wekî pira pêwendiya di navbera xelk û deshilatê de çalakiyan dikin, û di rîzbenda deshilata siyasî û li asta xwestek û daxwaziyên civakê de gellek bi bandor in.

Îrorojê ciwan, çi li ber girîngiya rêjeya wan di pêkhateya nifûsê de, yan jî li ber vê ku bi awayekî xwezayî fîdakar û guhertinxwaz in, hêza herî girîng ya mirovî ya Îranê pêk tînin, û hekî ciwan di her welatekî azad û demokrat de, zêdetir ji her karekî din, xwazyarê desteberbûna azadiyên xwe yên pîşeyî ne, eva di welatê me de bi sedema vê ku bi dirêjahiya dîrokê stema neteweyî li ser wan hebûye, û sîstemeke totalîtar zal bûye, û her cure bîrkirineke azad û azadjiyan jê hatiye zewtkirin, divêt ciwan zêdetir ji vê ku hilgirê hezeke pîşeyî û taybet bi xwe bin, û hilgirê pirogirameke pêkhateşikên ya demokrat bin, di vî warî de piştî bidestvehatina mafê neteweyî, rewş ji bo bidestvehatina mafê pîşeyî yê wan jî xweş

dibe. Lewra hewldan ji bo rêkxistin û komkirina hêz û şiyanan di vê qonaxa xebata demokratîk û azadîxwaziyê de hewcehiyeke haşahilnegir e. Bi baldan bi vê ku demokrasî li kultura civakê de cih negirtiye, û pênaseyeke rohn ji bo takên civakê, û ji bo azadiyên wê di nav civakê de cih negirtiye, lewra mîkanîzma herî baş ku dikare berevankarê mafên mirovan û azadiyên ciwanan û vegeşînerê hişyariya wan be, heman rêkxistin (teşkîlat) di nav rêkxirawa me de ye. Lewra em herçend ku di rêkxistin û komkirina hêz û enirjiya xwe de serkevtîtir bin, ew qas jî asoya berçavên me zelaltir, û xebata me jî berhemdartir dibe. Her bi baldan bi vê rastiya haşahilngir jî bû ku Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê di yek ji qonaxên herî zêrîn yên tevgera rizgarîxwaziya neteweya Kurd de hate avakirin.

Dîroka bizava rizgarîxwaziya neteweya Kurd pirr e ji serwerî û cangorîtî û afirandinên ciwan û buhadar, û hevdem parastina exlaqê siyasî û pirensîpên mirovî rûyê xwe di vê bizavê de bi başî derxistiye. Hekî avakirina PDKÎ û piştre jî Komara Kurdistanê, xaleke guherînê bû di dîroka vê bizavê de, eva avakirina Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê jî amajeyeke mezintir e bo vê guhertinê û resenbûna vê tevgerê. Bi avakirina vê rêkxirawê û rêkxirawên taybet bi texên din ên civakê, tevgera neteweyî-demokratîk biyaveke hemûalî û giştgîr bi xwe ve girt, ku bi dirêjahiya salên din, bandoreke berçav li ser vê bizavê hebû û heye.

Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê wekî yek ji deskevtên modern ên Komara Kurdistanê, û dînamîzma pêkanîna guhertinan di civaka Kurdistanê de, li 30'ê Rêbendana 1324 (Şibata 1946)'an û li rewşeke azad û demokratîk a Komara Kurdistanê di bajarê Mehabadê de hate avakirin, û çalakiyên xwe li jêr navê "Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê" dest pê kir. Ew rêkxiraw ku taybet bû bi texa ciwanan, wekî yekem rêkxirawa taybet bi ciwanan hate nav civaka Kurdî de, û karî di biyavên curbicur ên civakê de çalakiyên xwe vegeşîne, û kovara "Hawarî Nîştiman" wekî zimanhalê Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê çap û bilav bike. Piştî vê ku Komara Kurdistanê ji aliyê dijminên Komarê ve têk çû, rêkxirawa Ciwanan û birêvebirên wê jî ji hev bilav bûn, û Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê heya şoreşa gelên Îranê, û rêkxistina dubare ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê di qoxanên veşartî de mijûlî tekoşînê bû. Bandora Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê li ser serhildana salên 1967-1968'an, û şoreşa gelên Îranê xuya û berçav e. Piştî şoreşa gelên Îranê di sala 1979'an

de, Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê, bi awayekî fermî di 25.03.1359 (Hezîran sala 1980)'î de, dest bi tekoşîna xwe kir, û sala 1360 (1981)'an yekemîn Desteya Birêvebirî ava kir, û karî ku çalakiyên xwe di nav bajar û herêmên Kurdistanê de jî berfireh bike, û binkeyên xwe ava bike, û di heman demê de, kovara "Lawan" çap û bilav bike. Di vê qonaxa dîrokî de Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê wekî "Pêşmerge" li dijî siyasetên Komara Îslamî û ji bo bergirî ji xak û buhayên neteweyî dest bi tekoşînê kir, û şehîdbûna bi hezaran xortên xwîngerm û xwedî bawer ên vê neteweyê, di bereyên bergirî ji azadî û mafê neteweyî de, belgeyên vê rastiyê ne. Di vê qonaxê de jî dijminên gelê me derfetê nadin ku ew rêkxiraw erkên xwe yên pîşeyî bi cih bigehîne, û ji bo parastina nasnameya neteweyî û bergirî ji neteweya xwe, çiyayan dike çepera berxwedan û rabûnê. Ji 4-6'ê Befranbara sala 1379 (Çileya Pêşîn a sala 2001)'an de, yekemîn kongireya xwe bi serkevtin ve lidarxist, û karî pirogirameke demokratîk, li ser bingeha daxwaziyên ciwanan di Îran û Kurdistanê de bipejirîne, û organên xwe serûber bike.

Avakirina Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê bi komkirina hêz û şiyanên texa herî girîng ya civakê wate ciwanan, karî têhn û gurriyeke pitir bide tevgera neteweyî-demokratîk ya neteweya Kurd di Kurdistana Îranê de, ku di lûtkeya vê bizavê de, em rêberê navdar û camêr ê neteweya xwe Dr. Qasimloyê qet nemir dibînin ku tekoşîna xwe ya siyasî ji Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê ve detst pê kir, û bi hewl û tekoşîna bê rawestiyana xwe di Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê û piştre jî di PDKÎ de, siyaset û stratejiyeke nû ji bo vê tevgerê darêt, ku niha jî rêvîngên vê riya pîroz bi şanazî ve di vê rasteriyê de tekoşîna xwe dimeşînin.

Derbazbûyiya tekoşîna Ciwanan di Kurdistana Îranê de, çi di biyavê pîşeyî û çi jî di çarçoveya xebata neteweyî-demokratîk ya gelê me de, bi rêberatiya PDKÎ nîşan dide ku ew qet di birêvebirina erkên xwe yên pîroz de xemsarî nekirine, û hertim di refa herî pêşê ya xebatê de bûne. Hest bi berpirsayetîkirin û cangorîtiya ciwanên Kurd encama rasterast ya vê rewşa dijwar bû, ku rejîmên Paşayetî û Komara Îslamî ya Îranê bi ser wan de sepandibûn. Ew rejîm ne tenê perwerdekirin û giringîdana bi pirsa ciwanan pişt guh ve avêtibûn, belkû hertim di hewla vê yekê de bûn ku ji riya pêkanîna astengiyên siyasî û civakî ve, wan ji erk û hestên xwe yên nîştimanî dûr bixin.

Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê bi dirêjahiya temenê xwe, hertim wekî yekîtiyeke kêrhatî hewl daye ku di hemû çeperên berevanîkirin ji parastina nasname û buhayên neteweyî yên gelê Kurd û desteberbûna mafê neteweyî de, xebatê bike. Her ji beşdariya di bergiriya çekdarî ve bigre heya xebata dîplomasî, di hember gehandina dengê azadîxwazane yê Kurdan bo nav nawend û kom û komeleyên siyasî û kulturî de. Di serdemên deshilata paşayetî û piştî herifandina Komara Kurdistanê, herçend ku xebata eşkere qedexe bû, lê ciwanên tekoşer her bi armancên Komara Kurdistanê wefadar bûn, û erkên xwe yên neteweyî û demokratîk ji bîra xwe nebirin.

Xebat û çalakiyên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê di navxwe û li derveyî welat vê yekê nîşan dide ku ew rêkxiraw dikare organîzasiyoneke baş be, ji bo nasandina kêşeya neteweyî, û eşkerekirina çewsandinê ji aliyekî ve, û mînakek jî be ji bo baştir perwerdebûna ciwanan, û nasyarbûna wan bi demokrasî û xebatkirinê re, ji bo bidestxistina mafên pîşeyî. Her di rastaya hewldan bo nasandina kêşeya Kurd û çûna bo nav civaka cîhanî, xwe bi erkdar dizane, û bi endambûna wê jî, di rêkxirawa navneteweyî ya Ciwanên Sosyalîst û gellek rêkxiraw û nawendên cîhanî yên taybet bi ciwanan, wekî riyeke baş û kêrhatî dihesibîne, di hemberî desteberbûna vê armancê de.

Îro ciwan çi li Îranê û çi jî di Kurdistanê de, di nav rewşeke dijwar de ne, û her roj zêdetir ji aliyê dîktatorên hakim bi ser vî welatî de, hewla jinavbirin û bêhurmetîkirina bi wan tê dayîn, ku ew yek jî vê rastiyê nîşan dide ku xebata ciwanan û çalakiyên wan, dikarin metirsiya mezin bin li ser nemana kevneperestî û dîktatoriyê. Komara Îslamiya Îranê îro rojê ji her demekê zêdetir ji bîra azadîxwaziyê, û bilindbûna asat hişyariya neteweyî ya ciwanan ditirse. Ciwanê îro ciwanekî/e bihest û armancxwaz e, lewra digel vegeşîna civakê û teknolojiyê, tê çaverêkirin ku hizra nûxwaziya ciwanan bi ser cemeda kevneperestiyê de zal be.

Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê, dersxwan û perwerdê xwendingeha Komara Kurdistanê ye, û di pêxema vê armancê de mil bi milê xebata neteweyî-demokratîk ya neteweya Kurd heya bidestveanîna armancên şehîdan Qazî, Qasimlo û Şerefkendî û hemû şehîdên Kurd û Kurdistanê xebatê dike, lewra hewce ye ku ciwan bo beşdariya di vê riyê de hemû hewl û şiyanên xwe bo bidestveanîna vê armamnca bilind û mirovane bi kar bînin.

Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê bi piştqahîmiya bi vê Bername û Pêrewa demokratîk û serdemiyane, xebatê bo nehêştina her cure kultureke kişk di pêxema demokratîzekirina kultura Kurdî de dike.

Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê baweriya wê, bi azadî û derfeta yeksan, di nav hemû takên civakê de heye, û jêve ye ku dibe hewcehiyên xweşderbazkirinê û derfeta kar û pîşe jê re pêk were, û rewşeke baş ji bo xwendinê jê re bê amadekirin, û rêz ji bîr û bawerî û şêweyên bîrkirina wê bihê girtin, û pêşeroja jiyana wê hêvîbexş be.

Bo vê armancê jî nûnerên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê, ew Bername û Pêrewa ku pejirandiya kongireya heştem, "**Kongireya 70 salî ya Yekîtiya Ciwanan**", û li jêr diruşma "**Îro em xebatê dikin, bona vê ku di siberojê de bi azad bijîn**", dikin binêşeya kar û tekoşîna xwe, û yekîtiya xwe. Bername û Pêrewa nû, rengvedana guherînkariyên îro yên Kurdistana Îranê ne, û li ser bingeha van erk û resaletan hatiye dariştin ku qonaxa nû ya xebat û tekoşîna gelê me, xistiye ser milê Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê.

Beşa Yekem:

Bernameya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê

Fesla yekem:

Derheq tewahiya pêkhateya civakê de

1-Hewldan bo pêkanîn û cihgirkirina civakekê li ser bingeha demokrasiyê, û wan bingehên sosyalîzmê, ku digel demokrasî û rengbirengî û mafên mirovan hevdu digrin, di pêxema jiyaneke baş bo hemû tex û qatên civakê

2-Piştevanîkirin ji gihîştina bi hikûmeteke demokratîk a federal û sekolar û piloralîstî

3-Bihêzkirina hevkarî û pêwendiya digel ciwanên neteweyên din ên Îranê ku baweriya wan bi mafê neteweyî yê gelan di vî welatî de heye, di pêxema dirustkirina civakek azad û demokratîk de.

4-Tekoşîn bo desteberkirina alavên zanyarî û teknolojiya serdem bo hemû tex û qatên civakê.

5-Hewldan bo pêkanîna derfetên kar, û xwepêgehandina hemû tex û qatên civakê ji aliyê deshilatê ve.

6-Zextxistina li ser deshilatê di pêxem dabeşkirina dahata tewahiya çavkaniyên xwezayî û dahata welat bi awayê dadperwerane bo nehêlana hejariyê

7-Piştevanîkirina ji tex û qatên pîşeyê yên demokratîk ên civakê da ku ji riya rekxiraw û rêkxistinên taybet bi xwe ve, daxwaziyên xwe bixib ber bas.

8- Eşkerekirin û berberekaniya digel her cure siyaseteke naserdemî, ku maf û azadiyên bingehîn pişgguh ve bavêje, û bibe sedema ferq û cudahîdanînê di navbera mirovan de.

9-Hewldan bo cihgirkirina yasaserwerî û piştevanîkirin ji vegeşandina çanda diyalog û pêkvesazanê di civakê de.

10-Hewldan bo bingehdanîna civakeke mirovserdest û nehêştina cudahiyan di navbera keç û kuran di civakê de.

Fesla Duyem:

Li derbarê Ciwanan

1-Hewldan bo vê ku deshilata siyasî di Kurdistanê û Îranê de, pirograme ke baş ji bo vegeşandina jiyan û rewşa ciwanan, li gora stratejiyeke nîştimanî û giştgîr û berdewam di hemû biyavên (siyasî, aborî, civakî, kulturî û zanistî, werzişî, û ...hwd de hebe).

2- Hewldan bo nehêştina sedemên tûşbûnan ciwanan bi tawanan, û ji rê derketinên civakî û piştevanîkirina ji nawendên çaksaziyên civakî, bi taybetî nawenda binbirkirina îdz û îtiyadê.

3-Girîngîdan bi wan ciwanên astengdar, yan jî yên ku tûşî nexweşiyeke cesteyî û derûnî bûne, û hewldan bo vedîtina riyekê ku îmkanatên hewce bo çareserkirin û pêregihîştina bi wan berhev bike.

4-Hewldan bo binbirkirina çanda bi zorî neçarkirina keç û kuran di pêxema jiyaneke hevbeş de, û qedexekirina wê bi hemû awayekî.

5-Vegeşandina kar û çalakiyên hunerî, çandî û werzişî di nav ciwanan de, û berhevkirina alavên “tefrîhî”, û rêkxistina geriyan û geştên bi kom û bi hev re.

6-Hewldan bo nehêştina astengiyên li pêşberî vegeşandina şiyanên ciwanan.

7-Piştevanîkirin ji avakirina sentera rewşenbîrî û civakî bo ciwanan

8- Avakirina pira pêwendiyan di navbera ciwanan û deshilatê, û gehandina dengê ciwanan bo nawendên biryarder li deshilatê, û rengvedana xwestek û daxwaziyên ciwanan di biryarên sereke de.

9- Handan û perwerdekirina ciwanên Kurdistanê bo xebata li dijî diyardeyên kirêt û ew astengî û kêşeyên civakî ku di nav civakê de hene, yan jî di nav civakê de serî hildidin, û dibin astengiya li ser riya pêşkevtinê.

10- Zextxistina li ser hikûmetê ji bo piştevanîkirina ji her sîstemeke taybet bo vedîtina hêz û şiyanên ciwanan, û dana kar bi wan di kertên berhemanînê de.

Fesla Sêyem:

Derheq erkên neteweyî û nîştimanî

1-Beşdarî di tevgera rizgarîxwaziya neteweyî-demokratîk ya neteweya Kurd di Kurdistana Îranê de, û piştevanîkirina ji tevgera azadîxwazane û demokratîk ya neteweyên Îranê.

2-Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê, PDKÎ wekî rêberê tevgera neteweyî-demokratîk ya neteweya Kurd di Kurdistana Îranê de dihesibîne.

3-Xizmet û parastina berjewendiyên giştî ên neteweya Kurd û deskevtên xebata rewa û neteweyî di hemû beşên Kurdistanê de

4-Hewldan bo neçarkirina deshilata siyasî, (nawend) bi qebûlkirina rastiya civaka Îranê, û bi rewazanîna mafê diyarîkirina çarenûsê bo neteweyan.

5-Dirustkirina pêwendiyeke bihêz digel ciwanan û rêkxirawên taybet bi ciwanan di beşên din ên Kurdistanê de.

6-Avakirina pêwendî û alîkariyên qahîm digel komele û rêkxirawên demokratîk û pêşkevtinxwaz ên Kurdistan û Îranê di pêxema xizmeta bi pêşxistina xebata mafxwazane ya neteweya Kurd û tevgera neteweyên Îranê.

7-Handan û perwerdekirina ciwanên Kurd bo tekoşîna di pêxema vejandin û parastina kultur û ziman, û folklor û hunera resen ya Kurd û parastina şûnwarên dîrokî.

8-Dabînkirina rewşa hewce û bi cî, bo vegeşandina kultur, ziman, folkolor û hunera resen ya kêmaniyên ayînî û neteweyî yên rûniştiyê Kurdistanê.

9-Nasandina daxwaziyên rewa ên Kurd û tevgera neteweyî-demokratîk ya wê bi gelên cîhanê

Fesla Çarem:

Li ser Xwendinê

1-Hewl û tekoşîn bi armanca binbirkirina nexwendewariyê di nav zarokan û ciwanên Kurdistanê de, û pêngavhilgirtina di pêxema bi zorîkirina xwendinê bo zarokan heya temenê 15 saliyê.

2- Hewldan bo dariştina bernameyên xwendin û hînkirinê bi baweriyeke pêşkevtî, û nehêlana şûnwarên her îdeolojiyeke kevneperestane û şovenîstî di bernameyên xwendinê de, û darêtina bernameyên xwendinê bi awayekî modern û serdemiyane ku (sekolar) be.

3-Hevkarîkirina digel dersxwanên xizan û desteng bo domandina xwendinê bi her riyeke hewce, û vegerandina wan ciwanên ku ji xwendinê veqetiyane, û hewldan bo cîbicîkirina xwendina bi xorayî ji bo hemû kesî heya asta herî bilind ya xwendinê.

4-Xebat bo bidestveanîna armanca mêjdem ya bi fermînasîna zimanê Kurdî, û xwendina bi zimanê Kurdî di hemû qonaxên hînkirin û perwerdehiyê de, û şarezakirina dersxwanan û xwendekaran digel dîroka neteweya Kurd, û bicihkirina sîstemeke perwerdehî û nîştimanî di bernameyên xwendinê de.

5-Girîngîdan û pêkanîna derfta xwendinê, di gund û herêmên dûrdest ên Kurdistanê de.

6- Hewldan bo danîna borsiyeya xwendinê bo ciwanan ji bo çûna wan bo derveyî welat, û vegeriyana wan bo Kurdistanê piştî bidawîanîna xwendinê li rastaya xizmet bi armancên neteweyî yên neteweya Kurd

Fesla Pêncem:

Li derheq cîhana Derve

1-Hewldan bo bi endambûna li nawend û rêkxirawên cîhanî ên demokratîk bi giştî û rêkxirawên mafên mirovan û pêwendîdar bi ciwanan bi taybetî.

2-Hewldan bo nasandina çand û kultura kurdî bi neteweyên din.

3-Piştevanîkirina ji carnameya gerdûnî ya mafên mirovan û hewldan bo cihgirkirina hemû xal û bendên wê.

4-Piştevanîkirina ji xebata ciwanên azadîxwaz ên cîhanê bo gihîştina bi mafên wan ên rewa.

5-Hewldan û piştevanîkirin ji xebata li dijî terorîzmê, bi hemû aliyên xwe ve, û mehkûmkirina hemû şêweyên terorê ku li jêr her nav û îdeolojiyekê de be.

6- Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê hewl dide ji bo raxistina ber çavan ya pirsa Kurd bi giştî, û ciwanên Kurd bi taybetî, li (IUSY) û hemû rêkxirawên din ên cîhanî, û herwisa hewldan bo bidestveanîna piştevaniya wan ji xebat bo mafên netewe û ciwanên Kurd di van rêkxirawan de.

Beşa Duyem:

Pêrewa Navxwe ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê

Madeya Yekem:

Nav û armancên sereke:

1-Navê Rêkxirawê (Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê) ye, û di hemû cihekî vê Pêrewa Navxwe de wekî "Yekîtiya Ciwanan" tê bi nav kirin.

2- Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê rêkxiraweke siyasî-pîşeyî ya demokratîk e, ku ji bo pêgehandin û rêkxistina ciwanan ji riya xizmet bi armancên neteweyî-demokratîk ên neteweya Kurd û rêzgirtina ji mafê gelên din ên Îranê tekoşînê dike, û di pêxema bidestxistina mafên ciwanan û bidestveanîna mafên wan di Kurdistana Îranê de, û pêkanîna civakekê ku bingehên sosyalîzm û demokrasiyê tê de hatine cihgirkirin xebatê dike.

Madeya duyem:

Endametiya di Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê de

Hemû hemwelatiyeke ciwan ê rûniştiyê Kurdistana Îranê, û hemû ciwanekî Kurd ê Îranî, dikare bibe endamê Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê, bi van mercên ku:

1-Bername û Pêrewa Navxwe ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê qebûl bike, û ji bo cîbicîkirina wan tekoşînê bike.

2-Temenê wî/ê di navbera 15-35 saliyê de be.

3-Endamê tu rêkxirawekê nebe, ku endametiya di wir de, digel berjewendî û erkên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê û armancên tevgera neteweyî-demokratîk ên neteweya Kurd de yek negre.

4-Forma endametiya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê tejî bike, û komîteya navçeya wî/ê, piştgiriya wî/ê bike.

Têbînî:

1-Her ciwanekî Kurd ê beşên din ê Kurdistanê, hekî di Kurdistana Îranê de, digel hevwelatiyekî kurd ê vê beşê jiyana hevbeş pêk anîbe, dikare bibe alîgirê teşkîlatî yê Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê.

2- Nûciwanên temen 13-14 salî dikarin wekî alîgir di Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê de, navnivîsiyê bikin.

Madeya sêyem:

Erk û mafên endamên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê

Erka li ser milê Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê ye ku:

1-Di Tekoşîna xwe de pêrewan navxwe ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê berçav bigre, û ji bo cîbicîkirina bendên wê tekoşînê bike.

2-Pêrewiyê ji disîplîna navxweyî ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê bike, û nihêniyên wê biparêze.

3-Bergirî ji armanc, siyaset û helwestên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê bike, û bo bihêzkirina refên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê tekoşînê bike.

4-Bo pêkanîn û vegeşandina pêwendiya digel texên civakê û bi taybetî ciwanan tekoşînê bike, û ji bername û siyaset û helwestên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê wan agadar bike, û ciwanan han bide, ku li dewra Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê kom bibin.

5-Di kar û çalakiyên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê de beşdar be, û biryar û pêşniyar û siyasetên wê bilav bike.

6-Biryar û pêşniyarên organa serveyî xwe li gora pirensîpên rêkxiraweyî cîbicî bike.

7-Bo jêhelbirina asta zanyarî û pileya zanyariya xwe hewl bide, û kesên din di vê biyavê de han bide.

8- Heqê endametiyê bide.

1-Nav û navbang û îmkanat û serweriyên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê biparêze, û berjewendiya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê neke goriyê berjewendiyên takekesî.

Hemû endamekî/e Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê mafê vê yekê heye ku:

1-Ji bo endametiya her yek ji organên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê bihê hilbijartin, û ji bo hilbijartina organan deng bide.

2- Ji riya teşkîlatî ve rexne, û bîr û boçûnên xwe bigehîne hemû organên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê.

3- Hemû endamekî/e Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê mafê eşkerekirina ramana xwe li ser biryar û pêşniyarên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê heye.

4- Di hemberî her biryarekê de, ku di organ yan her civînekê de biryar li ser wî/ê tê dayîn, bergiriyê ji xwe bike, û piştî vê ku bi piraniya dengê organa servetir ceza jê re hate diyarîkirin, pêbendê biryarê be.

5-Bi berçavgirtina hemû usul û pirensîpên rêkxistinî (teşkîlatî) di rêkxirawê de, agehdarî biryar û helwestên xwe be.

Madeya Çarem:

Cezaykirina endam:

Endamê/a Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê hekî wan erkên xwe, yên ku di madeya sêyemîn de hatine diyarîkirin, di dema hewce de cîbicî neke, li gora kêmkariya wî/ê, ew kes tê cezakirin.

Cezaya endamê/a Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê li gora cureya kêmkariyê, bi vî rengî ye:

-Agehdarkirin.

-Lomekirina bi nivîsar.

-Jêstandina berpirsyariyê.

-Jêstandina pileya endametiyê bo heyama mehek heya şeş mehan.

-Hilavîstîhêlana endametiya wî/ê ji mehek heya şeş mehan.

-Derkirina ji Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê

Têbînî:

1-Armanc ji cezaya rêkxiraweyî, pêgehandina endam e, û tenê wê demê endam tê cezakirin, ku riyeke din wekî rexne, rênîşandayîn, û razîkirina wî bo başkirina kar û kiryarên wî, bibandor nebe.

2-Dema herî dirêj ya helavîstinê şeş meh e, di wê demê de ew endam nikare bibe endamê tu yek ji organên rêkxirawê.

3-Endamê helavîstîhêlayî paş tewawkirina dema cezaya xwe, derbazbûyiya tekoşîna wî di rêkxirawê de, jê re berçav tê girtin, û ji riya organa servetir kar jê re tê diyarîkirin.

4-Biryar li ser cezakirina endam li civîna organa xwe, yan jî organa servetir ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê de, bi piraniya dengan tê dayîn.

5-Endamek ku biryara cezayê jê re tê dayîn, dikare ji riya nivîsê ve, aliyê kêm heya 30 rojan piştî agehdarkirinê daxwaza pêregihîştin û çavgerandinê, li organa servetir bike.

6- Biryara cezakirinê dibe bi agehdariya komîteya giştî bihê gehandin.

7-Erka li ser milê komîteya birêvebiriya giştî ye ku daxwaza pêdeçûna bi ser cezayê de, di kombûna Birêvebiriya Giştî de bixe ber bas û pêdeçûnê.

Madeya pêncem:

Hilbijartin û biryardan

Hilbijartin û biryardan di nav refên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê de, bi vî awayî tê encamdan:

1-Bo hilbijartin û pejirandina biryarê li her organekê hewce ye ku nîve zêde yek, ya dengan bi dest bixe.

2-Dengdan bo biryar, bi awayê eşkere, û hilbijartin bi awayê dengdana veşartî dibe.

Madeya şeşem:

Bingeha rêkxistina Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê

Bingeha rêkxistina Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê li ser bingehên demokratîk hatiye avakirin, ku ew yek jî bi vê manayê ye ku:

1-Hemû endamên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê li gora pirensîpên rêkxiraweyî mafê wekhev di hilbijartinê de hene.

2-Hemû organên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji xwarê heya serê bi hilbijartin û bi dengê piranî têne avakirin, û bi rê ve diçin.

3-Dibe biryarên organa servetir ji aliyê organa xwartir ve bê cîbicîkirin.

4-Organên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji serê bo xwarê, û ji xwarê bo serê, rapora tekoşîna xwe didin hevdu.

5-Bo hemû endamên organekê bi bê cudahî, yek disiplîn heye, ku dibe peyrewiyê jê bikin.

6-Baskirin û biryardan ji organa herî bilind bo organa herî xwar, bo hemû endamên organê ye.

Madeya Heftem:

Kongireya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê

Kongire organa herî bilin ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê ye. Kongireya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê her du salan carekê bi beşdariya endamên eslî û cihgirê Komîteya Birêvebiriya Giştî û şêvirmendên Komîteya Birêvebriya Giştî, û ew rêjeya ku Birêvebiriya Giştî bo kongireyê diyarî dike, ji nûnerên endamên lawan, pêk tê.

Erk û deshilatên kongireyê ew in:

1-Guh bide rapora siyasî, civakî û darayî ya Komîteya Birêveberiya Giştî, û piştî behs û lêkolînê biryarê li ser dide.

2-Pêdeçûnê bi ser Bername û Pêrewa Navxwe ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê de dike, û hekî hewce be guhertinê bi ser de tîne, û piştre jî dipejirîne.

3-Ayînnameya karî ya Birêvebiriya Giştî û pirojeya karî ya derveyî welat dipejirîne, û kar û tekoşîna Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê di heyama du kongireyan de dixe ber bas.

4-Rêbaz û stratejî û kar û tekoşîna Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê heya kongireya bihê diyarî dike.

5- Komîteya Birêveberiya Giştî û cihgirê Birêveberiya Giştî hildibjêre.

Madeya Heştem:

Kongireya na asayî ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê

Kongireya na asayî ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê di demekê de tê lidarxistin ku:

1-Astengeke wisa hatibe pêş ku Komîteya Birêvebiriya Giştî nekare çareser bike.

2- Derfeta lidarxistina kongireyê tunebe.

3- 2/3 (du li ser sê) ji endamên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê yan Komîteya Birêveberiya Gişti daxwaza lidarxistina kongireya na asayî bikin.

4-Di rewşeke bi vî rengî de kongireya na asayî ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê deshilata kongireyê heye.

5-Kongireya na asayî ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji endamên eslî, cihgir û şêvirmendên Komîteya Birêveberiya Gişti û nûnerên organên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê pêk tê.

6-Radeya nûnerên her organekê ji aliyê Komîteya Birêveberiya Gişti ve têne diyarîkirin. Di wê demê de dibe radeya nûnerên organan, ji endamên eslî, cihgir û şêvirmendên Komîteya Birêveberiya Gişti zêdetir bin.

Madeya nehem:

Komîteya Birêveberiya Gişti:

Di navbera du kongireyên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê de, Koîteya Birêvebriya Gişti wekî organa herî bilind ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê karûbarên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê bi rê ve dibe. Komîteya Birêveberiya Gişti di hemberî kongireyê de berpirsyar e.

Erk û deshilatên Komîteya Birêveberiya Gişti ew in:

1-Biryarên Kongireyê cîbicî bike.

2-Heyeta Birêveberî, sekreter û cihgirê sekreter hilbijêre.

3-Serperestiya hemû organên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê dike, û raporên wan dinirxîne, û ji karûbarên wan vedikole.

4-Dikare beşdariyê di civînên organên xwe yên xwartir de bike, tenê bi hebûna mafê dana pêşniyaran.

5-Berpirsê pêwendiya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê digel rêkxirawên dinê ye.

6-Çavdêriyê bi ser dahat û derkevta Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê de dike.

7-Radeya abûneya endametiyê diyarî dike.

8-Bernameya şeş mehî bo kar û tekoşîna xwe dadine, û bernameyên organên xwartir ji xwe pesend dike.

9-Dibe aliyê kêm sê mehan carekê kom bibe.

10-Li ser şûn û dema kongireyê biryarê bide, û rêjeya nûnerên endamên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê di kongireyê de diyarî dike.

11-Pêrewa Navxwe ya Heyeta Birêveberiyê dadinê, û pêdeçûna bi ser Pêrewa Navxweyî ya nawendan û hemû komîteyên xwe yên navxwe û derveyî welat dike, û piştre dipejirîne.

12-Dikare kongireya na asayî ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê li gora madeya 8 pêk bîne.

Têbînî:

1-Ew kes dikarin bibin endamê Komîteya Birêveberiya Giştî ku aliyê kêm du salan endametiya wan di Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê de hebe.

2-Civînên Komîteya Birêveberiya Giştî bi beşdariya 2 li ser 3 ya endamên eslî dibe fermî, û ew biryar demekê dibin biryara dawiyê ku zêdetir ji nîva endamên eslî dengê xwe didnê.

3-Endamên Komîteya Birêveberiya Giştî ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê, nabe endamê komîteya Birêveberiya Giştî ya tu rêkxiraweke din bin. Ciwanên akinciyê derveyî welat dikarin bibin endamê birêveberiya rêkxirawên pîşeyî yên bîhanî, ku tewahiya binema û yasayên demokratîk bi rê ve dibin.

4- Ew kes dikarin xwe ji bo Birêveberiya Giştî ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê berbijêr bikin ku temenê wan ji 32 salî zêdetir nebe.

5- Komîteya Birêveberiya Giştî dikare bi qasî 2 li ser 3 ji endamên eslî, şêvirmendan ji xwe re hilbijêre, û endamên rawêjkar di civînên Birêveberiya Giştî de beşdar dibin û dengê wan yê şêvirmendiyê heye.

6-Her endameke Komîteya Birêveberiyê hekî biryar û pêşniyarên kongireyê, û wan erk û berpirsatiyên ku pê hatiye spartin, bi başî cîbicî neke, komîteya birêveberiyê mafê vê yekê heye ku li gora pêrewa birêveberiyê cezayê jê re diyarî bike.

7- Tu kes nikare ji du dewreyan zêdetir sekreterê giştî ê Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê be.

Madeya dehem:

Heyeta Birêveberiyê:

Di navbera du civînên Birêveberiya Giştî de, heyeta Îcrayî karûbarên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê bi rê ve dibe, û di hemberî Komîteya Birêveberiya Giştî de berpirsyar e.

Têbînî:

1-Sekreterê Giştî û cihgirê Sekreter û berpirsê derveyî welat, û cihgirê wî, endamên Heyeta Birêveberiyê ne.

2-Heyeta Birêveberiyê mafê guherîna biryarên Komîteya Birêveberiya Giştî nîne.

3-Li ser mijarên çarenûssaz û taybet bi Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê, dibe ku Heyeta Birêveberiyê ramana Birêveberiya Giştî wergire.

4- Heyeta Birêveberiyê rapora civînan û karê xwe dide Komîteya Birêveberiya Giştî.

5- Di rewşekê de ku sekreter yan Heyeta Birêveberiyê daxwaza pêkanîna civîna endamên Komîteya Birêveberiya Giştî bikin, lê 2 li ser 3 ji endaman tê de amade nebin, di civîna bihê de bi amadebûna nîve zêde yek ya endaman civîn dibe resmî, û biryar jî bi dengê 2 li ser 3 ya beşdarên civînê tê pejirandin.

Madeya 11:

Rêkxirawên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê

Rêkxirawên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê pêk hatine ji:

1-Pol, binêşeya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê pol e, Pola gund yan tax, ku ciwanên gundekê yan çend gundan li hev nêzîk in, û ciwanên yek ji taxên bajar di refên xwe de kom dike.

2-Komîteya navçe yan komîteya bajar, ku polên gund û taxan di herêmê de serperestî dike.

3-Komîte Şaristan, ku karûbarên komîteyên herêm û bajar serperestî dike.

4-Endamên komîteyên gund û taxan di civîna endamên gund yan taxan de têne hilbijartin, û endamên komîteya navçe û komîteya bajar, ji aliyê nûnerên hemû polên gund û taxan ve di konferansa navçe yan bajar de, û endamên Komîteya Şaristan di konferansa şaristan de têne hilbijartin.

Têbînî:

1-Endamên Komîteya Navçe û bajar, dibe aliyê kêm sê meh be ku bibin endam, û endamên komîteya şaristan dibe şeş meh bi ser endametiya wan re derbaz bibe.

2-Di rewşa taybet de, komîteya Birêveberiya Giştî dikare şêweyên din yên kêrhatî bo rêkxistina Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê danê.

Madeya dozdehem:

Dahat Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê:

Dahata Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji wan çavkaniyê jêr ve tê dabînkirin:

1-Heqê endametiya endaman

2-Yarmetiya endaman, alîgiran û dostan û komîteyên navxwe û derve yên welat yên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê.

3-Dahata tekoşîna çandî û hunerî ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê.